Kaplan, F. (2020). Nav û cureyên sewalan (ajelan) û çanda sewalvanîyê li devera Qerejdaxa Wêranşarê. *Folklor û Ziman,* 1(2), 102-122.
**Wergirtin/Received:** 2020-01-21
**Qebûlkirin/accepted:** 2020-04-28
**ORCID:** 0000-0002-1520-7069

# NAV Û CUREYÊN SEWALAN (AJELAN) Û ÇANDA SEWALVANÎYÊ LI DEVERA QEREJDAXA WÊRANŞARÊ

Ferhat Kaplan*

**Kurte**

Di çanda kurdan da cihê sewalvanîyê taybet e. Herêma Qerejdaxê jî yek ji wan herêman e ku çanda sewalvanîyê lê xurt e. Lê ji ber gelek sedeman çanda sewalvanîye lawaz bûye rewşa awarte ya kurdan û mercên sedsala ku em tê da dijîn, ev çand bi tunebûnê ra rû bi rû hiştîye. Di xebatê da hatîye armanckirin ku ev çand were tomarkirin. Keresteyên vê xebatê bi rêbaza hevpeyvînê hatîye berhevkirin. Hevpeyvîn bi sê kesan ra hatîye kirin ku li Qerejdaxê jîyane. Di xebatê da nav û cureyên sewalên kedî û kovî yên ku li herêmê dihên dîtin hatine berhevkirin û bi navlêkirina devoka herêmî hatine pênasekirin. Kevneşopên çanda sewalvanîyê ya li deverê û têgihên têkildarî vê çandê hatine tomarkirin. Berên sewalvanîyê yên tên xwarin û tên vexwarin, alavên têkildarî çanda sewalvanîyê hatîye tomarkirin.



**Bêjeyên Sereke:** Qerejdax, navên sewalan, Wêranşar, sewalvanî, çand

## ANIMAL NAMES AND SPECIES AND LIVESTOCK CULTURE IN THE KARAJDAKH REGION OF WERANSHAR

**Abstract**

Animal husbandry has a important place in Kurdish culture. The Karajdakh region is also one of those areas where the animal husbandry culture is strong. But for many reasons the animal husbandry culture has been weakened and the state of emergency of the Kurds and the conditions of the century in which we live, this culture has been faced with extinction. The study aims to record this culture. Materials for this study were collected through interviews. The interview was conducted with three people who live in Karajdakh. The study collected the names and species of domestic and wild animals found in the area and defined them by naming the local dialect. The traditions of the animal husbandry culture in the area and the concepts related to this culture have been recorded. Animal products are eaten and drunk, equipment related to animal culture is recorded.

**Keywords:** Karajdakh, animals names, Weranshar, animal husbandry, culture

* Lêkolerê serbixwe. Riha. E-mail: ferhatkaplan63@gmail.com

**Destpêk**

Sewal ew cure bûnewer in ku di afirandina çandan da cihekî giring digirin. Mirovan di destpêkê da ji bona ku xwe ji sewalên kovî biparêzin têkoşîyane, piştra ketine ber fikira sûdwergirtinê ji sewalan (Uçar, 2013, r. 1). Mirovên ku cotkarî kirine dîsa derbasî jîyana nêçirî û nîvkoçerîyê bûne û jê şûnda jî dest bi kedîkirina sewalan kirine û bi vî awayî ber bi jîyana koçerî/şivantîyê ve çûne (Baskıcı, 1998, r. 73). Li gor etnologan mirovahîyê pêşîyê kûçik û piştra bizin, beraz, mî, çêlek, pisîk, hesp, ker û hêştir kedî kirine (Çoban, 2017, r. 554). Bi kedîkirina sewalan ra pevrabûneka dûdirêj di navbera sewal û mirovan da çêbûye. Bi vê pevrabûna bi hezaran salan ra, çandeka sewalvanîyê derketîye holê. Di gelek deman da ji bo mirovan hebûna sewalan, bûye nirxeka herî hêja. Ji ber ku mirovan ji van sewalên kedî; ji bo xwarinê; ji şîr, qatix û goşt; ji bo lixwekirinê ji mû, çerm û hirîyê û ji bo kon, serax, binraxan û hwd jî, dîsa ji mû û hirîyê sûd wergirtine. Ji bilî vana mirovan ji bo bar, nêçîr û siwarbûnê ji hêz û beza sewalan jî sûd wergirtine.

Bi vê serdestîya mirovan ya li ser sewalan, nirxê sewalan li ber çavên mirovan her ku çûye zêde bûye û di jîyana rojane da cihekî gelekî giring girtine. Ji ber berjewendîyên xwe yên li ser sewalan mirovan her sewalek û navek lê kirine. Di pirtûka xwe da Walter J. Ong (2013, r. 69) jî bi vî awayî behsa vê mijarê dike: "Mirovên hov ji bo her kulîlk û her dara ku hewcedarîya jîyana wan pêk dianîn navek lê kirine. Lê darên daristanê yên ku hewcedarîya jîyana wan pêk nedihat guh nedanê û ji hinan ra gotine; ev devî ye, ev sewalek firoke ye"(Ong, hb, r. 69).

Ev tesbît ji bo kurdan jî di cih da ye ji ber ku çanda kurdan ya koçerîyê bûye sedem ku kurdan bi sedsalan debara xwe bi xwedîkirina sewalan kirîye. Ev jî li nava kurdan da bûye sedema xurtbûna çanda sewalvanîyê. Peyvên li sewalan û jîyana sewalvanîyê hatîye kirin çandeka dewlemend afirandîye.

Ev xebat bi fikira ku nav û termên vê çandê neyê jibîrkirin weke tomarkirinekê hatîye kirin. Di xebatê da li herêma Qerejdaxê sewal çawa dihên dabeşkirin, çi nav li wan dihên kirin û derbarê çanda sewalvanîyê da hinek agahîyên sereke cih digirin. Xebat ji çar serenavan û ji du pêvekan pêk tê; Bi kurtahî danasîna herêma Qerejdaxê, navlêkirina sewalan, çanda sewalvanîyê, encam û pêşnîyazî. Ji bo ku hinek têgih baştir werin famkirin di dawîya xebatê dabi navê "hin têgihên din li ser xebatê (ferhengok)" pêvekek biçûk hatîye amadekirin. Dîsa dawîya xebatê da bi navê "Pêvek 2" pêvekeka tabloya navên sewalan bi kurdî-latînî hatîye amadekirin. Di vê xebatê da em bi taybetî li ser beşa navlêkirina sewalan û çanda sewalvanîyê sekinîne.

Ji bo bidestxistina hin agahîyên derbarê vê mijarê da li ser hinek gotar, pirtûk û çavkanîyên elektronîk lêkolîn hatîye kirin. Bi rastî di van mijaran da zêde xebatên kurdî li ber destên me tune ne. Mirov ji bona çavkanîyeka xurt bi dest bixe divê têkeve qadê û xwe bigihîne kesên ku koçerî/sewalvanî kirine. Loma jî me bi sê kesên ku ji gund û deverên Meyremçayir, Seferya, Tenûr, Hesar û Çixirxêne û li wir jîyane û çanda sewalvanîyê baş dizanin hevpeyvîn çêkirin. Nemaze kesên ku di demeka jîyana xwe da şivantî, gavantî, selwantî, koçerî, bêrîvanî, nêçîrvanî kirine ji bo vê xebatê, çavkanîya herî dewlemend û bikêr e. Ji van kesên ku bûne çavkanî; bi Galya Kaplanê ra di 10ê gulana 2015an da, bi Osman Kaplanî ra di 14ê gulana 2015an da, bi Mustafa Taşî ra jî di 8ê hezîrana 2015an da hevpeyvîn hatine kirin. Di nava xebatê da kesên ku bûne çavkanî; Galya Kaplan wekî kesê çavkanî yê yekem (KÇ 1), Osman Kaplan wekî kesê çavkanî yê duyem (KÇ 2), Mustafa Taş wekî kesê çavkanî yê sêyem (KÇ 3) di nava kevanekê da hatine dayîn.

**1. Bi kurtî danasîna herêma Qerejdaxê**

Çîya û herêma Qerejdaxê ji gelek alîyan ve cihekî taybet e. Çîyayê Qerejdaxê di navbera deşta Dîyarbekirê û zozanên Rihayê da cih digire. Çîyayê Qerejdaxê ji volkaneka teqîyayî pêk hatîye û cihê wî yê herî bilind 1981 metre ye (Ertekin, 2002, r. 4-5).



Qerejdax ne tenê navê çîyayekî ye, heman demê da navê herêmekê ye ku hin deverên wê dikeve nava Sêwreg, Wêranşar, Dîyarbekir û Dêrika Çîyayê Mazî. Li hinek deverên Herêmê çandin hebe jî Herêm ji ber ku bi kevir e bi piranî ji bo çêreya sewalan dihê bikaranîn.

Îqlîma Herêmê çolter e. Havîn germ û ziwa, zivistan jî sar û şilî ye. Barana herî zêde di zivistanê da dibare (Ertekin, hb, r. 6). Heta demeka nêz jî daristanan gelek cih digirtin lê niha hew çend cure dar tenê lê mane. Li Qerejdaxê hin çem jî hene ku havînê ziwa dibin (KÇ 2).

Herêma Qerejdaxê ya devera Weranşarê ji ber ku sînorekî dîyar tune ye, ne dîyar e ku çend gundan dihewîne lê belê hejmareka rasteqîn tune be jî devera navborî ji zêdetirî bîst gundan û bi dehan mezrikan pêk dihê. Êlên (eşîrên) vê deverê gelek in û ji vana yên sereke ev in; Mehelî, Çuvan, Sefa, Hama, Keroya, Pora, Huska, Şehîna û hwd. Ji van êlan Sefa bi kirmanckî (ew ji bo zimanê xwe dimilî dibêjin) diaxivin. Ji bo berhevkirina keresteyên xebatê em li çend gundên deverê yên bi navê Meyremçayir, Seferya, Tenûr, Hesar û Çixirxê xebitîne.

**2. Navlêkirina sewalan**

Wekî xuya dibe ku erd, ax û avhewaya Qerejdaxê ji bo sewalvanîyê û jîyana koçerîyê pir guncan e. “Gelek eşîrên vê herêmê ji mêj ve ji deverên cuda ji bo koçerîyê hatine vira û li vira bi cih bûne” (KÇ 2). Êlên ku ji ber sedemên cuda hatine li vira bi cih bûne yan jî li vira koçerî kirine wan jî ev nirxdarîya vê herêmê kişf kirine û nexwestine ji vê herêmê herin.

Bi demê ra û bi xêra têkilîyên êlên curbicur, li deverê ji bo navlêkirina sewalan û çanda sewalvanîyê zimanekî herêmî û xurt peyda bûye. Hin têgih û navlêkirinên sewalvanîyê ji herêmên din yên Kurdistanê cudatir in.

Mirov bûnewerên li dora xwe li gor “hin taybetîyên wekhev” kom dikin. Mirov rasterast li gor berjewendîyên xwe van komana dîyar dikinû hiş têgihekê dide vêya û têgih jî wekî peyvekê peyda dibin. Ev komana li gor berjewendîyên mirovan li dora mirovan pêk dihê. Mirov bi van têgihan û navlêkirinan pergalekê ji bo jîyana xwe ava dikin. Bi vî awayî têkilî û ragihandin hêsantir dibe (Akerson, 2000, r. 68-69).

Em dê niha wekî du serenavên bingehîn sewalên kedî û sewalên kovî li gor navlêkirina wan analîz bikin.



**2. Navlêkirina sewalên kedî**

Sewalên kedî piranî ji sewalên çewligê pêk dihên. Di cîhanê da ji bo xwarin, lixwekirin, barkêşîyê nêzikî 40 cure sewalên çewligê dihên xwedîkirin (Ertuğrul û hev. , 2000, r. 98). Di xebata me da jî ev cure sewalên çewligê hene.

**2.1.1 Pez**

Li Herêmê pez navê giştî yên sewalên biçûk yên bi mû û bi hirî ne. Ev sewal gîya û şînahîyê dixwin û dikayin. Ev sewal ji bo şîr, goşt, hirî û mûyê wan dihên xwedîkirin. Li gor çermê wan bi hirî (pezê mêşinî) û çermê wan bi mû (pezê bizinî) dibin du beş (KÇ 1, KÇ 2).

**A. Pezê mêşinî:** Ev cure, pezê ku bi hirî ne. Pezê mêşinî nikarin li erdên asê biçêrin divê çêreya wan cihê rast be. Ev sewal li gor sal û zayendên xwe weha dihên polînkirin:

**Berx:** Pezê mêşinî yê nûçêbûyî ye. Ji bo zayenda mê û nêr navlêkirinên cuda tune ne.

**Kavir:** Pezê mêşinî yê ji yekê heta du salî ye. Ji bo zayenda mê û nêr navlêkirineka cuda tune ye.

**Berindîr:** Pezê mêşinî yê ji du salan mezintir û mê ye. Berindîr xwedî taybetîya zayînê ne. Ango dikarin biber bibin û bizên.

**Hogeç:** Pezê mêşinî yê ji du salan mezintir û nêr e.

**Mî:** Pezê mêşinî yê çar pênc salî ye. Mî xwedî taybetîya zayînê ye û pezê bişîr e.

**Beran:** Pezê mêşinî yê çar pênc salî ye. Beran xwedî taybetîya lêketinê ye. Di nava pezê mêşinî yên nêr da yê herî bisal ev e.

Pezên mêşinî li gor rengê xwe bi vî awayî dihên binavkirin (KÇ 3).

**Pezê sor:** Pezê mêşinî ye ku rengê hirîya wan qehweyî ye.

**Pezê reş:** Pezê mêşinî ye ku rengê hirîya wan reş e.

**Pezê zer:** Pezê mêşinî ye ku rengê hirîya wan zer e.

**Pezê gewr:** Pezê mêşinî ye ku rengê hirîya wan spî ye.

**Pezê beş:** Pezê mêşinî ye ku enîya wan gewr e.

**Pezê belek:** Pezê mêşinî ye ku rengê hirîya wan belek e.

**B. Pezê bizinî**



Ev cure, pezê ku çermê wan bi mû ne. Pezê bizinî dikarin bi çîya û kaşên asê ra hilperişkin û biçêrin ji ber wê li deverên ku çîya lê zêde nedihên xwedîkirin. [1] Ev sewal li gor sal û zayenda xwe weha dihên binavkirin (KÇ 1, KÇ 2, KÇ 3).

**Kar:** Pezê bizinî yên nûzayî ne. Ji bo zayenda mê û nêr navlêkirina wan ji hev ne cuda ye.

**Gîsk:** Pezê bizinî yên ji karan mezintir in. Temenê wan sal û nîvek in. Ji bo zayenda mê û nêr navlêkirina cuda tune ye.

**Tiştîr:** Pezê bizinî yên ji gîskan mezintir in. Temenê wan du sal in. Zayenda wan mê ye, xwedî taybetîya zayînê ne ango dikarin biber bibin lê hîn biber nebûn e.

**Bizaştîr:** Pezê bizinî yên ji tiştîran mezintir in. Temenê wan sê sal in û mê ne. Cudahîya wan ji tiştîran ewe ku karên wan hene ango bizaştîran zayîne tiştîr hîn nezayî ne.

**Hevûrî:** Pezê bizinî yên sê salî û nêr in, bi temen bi qasî bizaştîran in.

**Bizin:** Pezê bizinî yên ji tiştîran mezintir û çar pênc salî ne. Zayenda wan mê ye û dikarin şîr bidin.

**Nêrî:** Pezê bizinî yên ji hevûrîyan mezintir in û çar pênc salî ne. Zayenda wan nêr e û bi temen bi qasî bizinan in.

1 Pezên bizinî ji ber ku dikarin hilperişkin ji bona dar û daristanan xetere ne (KÇ 2).

### 2.1.2 Dewar

Dewar sewalên mezin yên kedî ne. Xwedî taybetîya şîrdayînê ne û di karên giran da ku hêz jê ra hewce ye dihên bikaranîn. Dewar jî sewalên kavêj in. Li gor temen û zayendên xwe dihên polînkirin. Li vê Herêmê, dewara ku jê ra “mange” dihê dihê gotin, li gelek herêmên Kurdistanê jê ra çêlek dibêjin. Sedema vêya dibe ku hebûna kurdên kirmanckîaxiv ya li herêma Qerejdaxê be û ev peyv ji kirmanckîya vê peyvê (manga) ketibe nav kurmancî. Dewar li gor sal û zayenda xwe û karên ku dikin, bi vî awayî dihên dabeşkirin (KÇ 1, KÇ 2).

**Golik:** Dewarên ku nûzayî heta yek salî ne. Ji bo zayenda mê û nêr navlêkirineka cuda tune ye.

**Tane:** Dewarên ku ji golikan mezintir yên heta du salî ne. Ji bo zayenda mê û nêr navlêkirineka cuda tune ye.

**Nogin:** Dewara ku ji taneyê mezintir e û mê ye. Ji du salî mezintir in û xwedî taybetîya zayînê ne ango dikarin bizên û şîr bidin.

**Cange:** Dewarên ji du salî mezintir in ango bi temen bi qasî noginan in û nêr in.

**Mange:** Dewarên ku ji noginan mezintir in. Çar pênc salî û mê ne.



**Ga:** Dewarên ji cange mezintir in. Çar pênc salî ne ku bi temen bi qasî mangeyê ne û nêr in.

**Deve**[2]: Ev cure sewal bi mezinbûna laşê xwe piranî ji bo barkêşîyê û hilgirtina mirovan hatîye xwedîkirin. Deve ji bo şîr, goşt û çerm jî dihê xwedîkirin. Deve ku bi kurdî bi navê hêştir dihê zanîn lê li herêma Qerejdaxê deve dihê gotin. Deve jî wekî sewalên din yên malê, li gor sal û zayenda xwe xwedî navên cuda ne (KÇ 1).

**Torim:** Deveya nûçêbûyî ya heta yek salî ye. Her du zayend jî bi yek awayî hatîye binavkirin.

**Mexlûr:** Deveyên ji torim mezintir yên heta du salî ne. Ji bo zayenda mê û nêr navlêkirineka cuda tune ye.

**Mecî:** Deveyên ji mexlûr mezintir in du-sê salî ne û mê ne. Xwedî taybetîya zayînê ne û dikarin şîr bidin.

**Cidan/Gidan:** Deveyên ku du sê salî ne ku bi temen qasî mecî ne û nêr in.

**Arwane:** Deveyên ku ji mecî mezintir in ku temenê wan çar pênc salî û mê ne.

2 Ji ber bawerîyên dînê Îslamê deve wekî sewaleka pîroz dihê pejirandin. Ji ber wê zêde jê dihê hezkirin (KÇ 2).

**Lok:** Deveyên ku ji cidan mezintir in ku temenê wan çar pênc salî û nêr in.

**Meye:** Deveyên xwedî du milik û stûdirêj in. Deveyê ji bo siwarbûnê ne.

**Dundil**: Li gor bawerîya gel ev deve ji cinsê deveyê hezretî Elî ne.

**Hesp:** Ew sewalên ku ji bo bar, cot û siwarbûnê ji hêz û beza wan sûd dihê wergirtin. Li gor temen û zayendên xwe bi vî awayî dihên dabeşkirin (KÇ 2, KÇ 3).

**Canî:** Hespên nûçêbûyî yên heta salekê ne.

**Ribe:** Hespên heta du salî ne ku zayenda wan nêr û mê ne.

**Mihîn:** Hespa mê ku xwedî taybetîya zayînê ye û ji du salan mezintir in.

**Fal:** Hespên ku wekî temen bi qasî mihînan in û zayenda wan nêr e.

**Ker:** Sewalên ku ji bo bar, cot, siwarbûnê ji hêz û beza wan sûd ji wan dihê wergirtin. Ji alîyê zayendê ve navên cuda li wan nahê kirin, hew li gor temenê wan, navên wan diguherin (KÇ 1, KÇ 2).

**Daşik:** Kerên ku temenê wan heta salekê ne.

**Sîpe:** Kerên ku temenê wan ji salekê heta du salan in.

**Ker:** Kerên ku ji du salanmezintir in.



### 2.1.3. Sewalên pînê (bibask)

Ev sewal li Herêmê ji bo sûdwergirtina ji hêk û goştê wan dihên xwedîkirin. Ev sewal bi hêkan zêde dibin û mêyên wan di demên cuda da çil rojî li ser hêkan rudinin ku çêlik ji hêkan derkevin. Rengê pûrta wan cuda cuda ye. Li hin herêman ji pûrta mirîşkan sûd dihê wergirtin û ji bo dagirtina balîfan dihê bikaranîn lê li vê deverê tiştekî weha me nebihîstîye. Ev sewalana li gor zayend, temen û hin taybetîyên wan bi vî awayî dihên dabeşkirin (KÇ 1, KÇ 2, KÇ 3).

**Mirîşk:** Sewala mê ya pînê ye, bibask e û hêkan dike.

**Çêlik:** Mirîşka ku nû ji hêkê derketîye.

**Fêrîk:** Mirîşka ku hîn baş negihaye. Mirîşka yek salî ye.

**Dîk:**[3] Nêrê mirîşkê ye ku di mirîşkê da fisan dike û dikare bi dengekî zîz û xurt bang bide.

**Anac:**[4] Mirîşka mê ya pîrbûyî ye.

3 Hin kes ji bo şerî jî dîkan xwedî dikin û perwerdeya şerî didinê (KÇ 2).
4 Weha xuya ye ku peyva “anac”ê ji “anaç”a tirkî dihê (F.K.).

**Qoqo:** Cureyekî dîkan e ku çîpên wan dirêj in.

**Elok:** Ji cinsê mirîşkan e,çermekî direj yê sor bi nikilê wan ve ye û ji mirîşkan girtir in. Ji elokên nêr ra 'dîkê eloka' dihê gotin.

**Ordek:** Cureyeka sewalên bibask e lingên wan bi perde ne ji ber vê dikarin pir xweş ajnê bikin. Ji çem û golan pir hez dikin.

**Qaz:** Cureyeka sewalên bibask in ku ji werdekan mezintir in.

**2.1.4. Sewalên ber malê**

Hinek sewal hene ku her dem bi mirovan ra rêhevaltîyê dikin. Jîyana xwe bi mirovan girêdayî, didomînin. Di navbera van sewalana û mirovan da berjewendîyên hevpar hene û ji ber wê, ji mirovan û jîngehên mirovan bi dûr nakevin. Ev ajelên hanê li gundan, li ber konan, li şivantîyê û hwd bi mirovan ra hevaltîyê dikin. Mirov jî çawa ku navan li mirovan dikin weha navan li wan jî dikin. Ev sewal li Herêmê bi vî awayî dihên binavkirin (KÇ 2).

**Kûçik/Se:** Sewalên kedî ne ku hevalbendîya mirovan dikin. Ji bo ewlehîya malê û ewlehîya sewalên çêrê alîkarên sereke yên mirovan in û gelekî bi kêrî şivan û gavanan dihên.



**Cewrik:** Kûçikên nûzayî heta yek salî ne.

**Dêlik:** Kûçikê mê yên ji yek salî mezintir in.

**Pisik:** Ev sewal jî hevalbendê mirovan e. Li deverê din yên Kurdistanê bi navê pisîk, pişik û hwd dihê zanîn. Pisik dikarin bi dizî têkevin malan û xwarina malê bidizin.

**2.2. Navlêkirina sewalên kovî**

Piranîya sewalên kovî di jîyana gundan û ya koçerîyê da ji bo mirovan hertim bûne xetere. Hin caran ji bo zadên wan, hin caran ji bo sewalên wan hin caran jî ji bo jîyana wan bûne xetere. Ji ber wê, mirovan ji bona nasîna wan sewalên xeternak navên cuda li wan kirine. Li gor awayê zayîna wan di jêr du serenavan da hatine dabeşkirin.

**2.2.1. Sewalên kovî yên guhandar**

Ev sewal bi zayînê zêde dibin. Sewalên ku li Herêmê dihên dîtin, bi vî awayî dihên binavkirin û dabeşkirin. (KÇ 1, KÇ 2).

**A. Xenzîr**: Sewalên kovî yên hem gîyaxur hem jî goştxur in. Sewalên kulaşê wan pir xurt eû bi vê xurtbûn û hovîtîya xwe li ser sewalên kedî xetere ne. Li hinherêmên din yên Kurdistanê wekî beraz/beraze jî dihên binavkirin. Li gor temen û zayendan xenzîr bi vî awayî dihên binavkirin.

**Kudik:** Çêjikên xenzîran in û ji zayînê heta yek salî ne. Ji bo her du zayendan jî heman peyv dihê bikaranîn.

**Yekane:** Xenzîrên nêr yên ji yek salî mezintir in û gihîjtî ne.

**Mahu:** Xenzîrên mê yên ji yek salî mezintir in û gihîjtî ne.

**B. Keftar:** Ajelên beratexur û goştxur yên ji cinsê kûçikan in. Ji bo sewal û mirovan metirsîyeka cidî ne. Li Herêmê kêm be jî dihên dîtin.

**C. Kurbeşk:** Ajelên hem gîyaxur hem jî goştxur in. Rengê pişta zere ne, bin zikê wan qahweyî û reş in. Çermê wan hişk e û bi qasî bîst kîloyan hene. Di bin axê da qulan çêdikin û dikarin tunelên pir dirêj çêbikin. Fêkî, kuvark û hingiv dixwin, dikarin sewalên kojende jî bixwin. Kurbeşk ber bi tunebûnê ve diçin. Kurbeşk ajelên pir wêrek in ji ber wê ji mirovan narevin, êrîşkar in.



**D. Rûvî[5]:** Ajelên goştxur in. Laşê wan ne zêde mezine lê bi piranî ji bo sewalên pînê sebeba metirsîyêne.

**2.2.2. Sewalên kovî yên kojende:**

Sewalên kovî ne ku tiştan dikojin. Di van sewalana da diranên pêşîyê dirêj û xurt in. Dikarin qulan di bin erdê da çêbikin û bi vî awayî nêçîra xwe bikin. Li Herêmê sewalên kojende ku dihên dîtin ev in (KÇ 1, KÇ 2, KÇ 3).

**Jûjî/Jûjo:** Sewalên gîyaxur û bêzerar in. Li ser pişta wanhistirîyên wan hene û ji bo xweparastinê, xwe li hev kom dikin û dikin gilok. Li Herêmê gelek dihên dîtin û bi piranî şev derdikevin derve.

**Siworîk:** Li ser dar û devîyan dijîn û sewalên gîyaxur in. Purta wan ya nermik heye û xwedî dûveka dirêj in. Diranên wan xurt in û bi diranên xwe yên pêşîyê daran dikojin û sewalên pir bilez in.

**Kwêrgî:** Li Qerejdaxê kergoşk bi vî awayî dihên binavkirin. Sewalên guhdirêj, dirantûj û bilez in. Goştê wan dihê xwarin û ji ber vê ji bo mirovan sewaleka nêçîrê ye.

**Xirnik:** Navê çêjikên kergoşkan in. Temenê wan heta yek salî ne.

5 Ji ber jîrbûna wan din av gel da çîrok û gotinê pêşîya li ser rûvîya rûdan e (KÇ 1, KÇ 2, KÇ 3).

**Mişk:** Sewalên biçûk û bilez in. Di carekê da dikarin heta deh çêjikan bizên. Bi biçûkbûna xwe dikarin bêyî mirovan têkevin hemû deveran û bi diranên xwe yên tûj dikarin xwarinê bikojin. Li malan û konan di nav nivînan, di binê kulînan û gelek deverên din da dikarin xwe veşêrin. Li Herêmê du cureyên din yên mişkan hene:

**Gurcan/ Cirbuh:** Ev mişkên mezin in.

**Fisteq:** Ev mişk bi rengê xwe sor in û ji ber ku di nav zevîyan da genim û zadên gel dixwin wekî mişkên genimxur jî dihên nasîn.

**2.2.3. Sewalên kovî yên hêkdar**

Sewalên ku hêkan dikin û bi vî awayî zêde dibin. Du cureyên wan hene ku sewalên hêkdar û yên xişok in.

**A. Sewalên kovî yên hêkdar û xişok**

Koma sewalan e ku lingkurt yan jî bêling in. Li Herêmê evana peyda dibin (KÇ 1, KÇ 2).

**Kûsî/Kosî:** Ajalên ku lingên wan kurt in û liva wan giran in. Li ser pişta wan qalikekî hişk heye û ji bo parastina wan e. Lingên kûsîyan li gor lingên reqan hîn xurt e û bineynûk in. Kûsî ajelên gîyaxur in. Li herêma Qerejdaxê kûsî gelekî dihên dîtin.



**Req:** Ev ajal ji malbata kûsîyan e lê berovajîyê wan, avî ne ango kûsîyê avî ne. Yek cudatîya wan ya ji kûsîyanew e ku şiklê lingên wan li gor avê ne. Cudatîyek din jî qalikê pişta wan hîn nermtir e û req ne ajelên gîyaxur in lê goştxur in. Req li Herêmê li qeraxê çeman û golan dijîn.

**Marîjok/Marmarok:** Çar lingên wan hene û dûva wan dirêj e. Li nava axê li cihê kevir, li banê malan û hwd dijîn. Bi piranî li malan najîn. Cudahîya marîjokan ji gumgumokan yek rengê çermê wan e yek jî ew e ku mirovnas in dihên ser destê mirovan û xwe ji mirovan zêde venagirin.

**Gumgumok[6]:** Sewalên ku bi çar lingên biçûk û bi dûveka dirêj in. Li nava axê li cihê kevir li banê malan û hwd da dijîn. Li asraxên malan pir dihên dîtin.

6 Ji ber hinek bawerîyên nava gelî, marîjok dihê hezkirin û gumgumok nahên hezkirin. Li gor bawerîyeka nava gelî, dema Îbrahîm pêxember dikira biavêtina nava agirî, marîjok hatîye tûyî agir kirîye ku vemirîne lê gumgumokê jî pufî agir kirîye ku agir gur bike. Bawerîyeka din batil jî ji bo gumgumokê heye ku kî heft gumgumokan dê mîna çûbe Hecê xêran bi dest bixe. (KÇ 2).

**Mar:** Sewalên kovîyên bijar in. Bedena wan dirêj û zirav e. Ji bo tevgera xwe lingên xwe yên taybet bikar diînin. Mirov van lingên taybet weke lingên wendayî jî binavdikin. Jara wan ji bo sewal û mirovan dikarin bibe sedema mirinê. Xwarina wan mişk, balinde û sewalên din yên biçûk in. Li Qerejdaxê li gor rengê çermê wan ev cureyên maran hene: Marê reş, marê sor, marê belek û marê cûn. Hin mar jî hene ku wekî qiloçekî di serê wan da heye û wekî marê qiloç, dihên binavkirin. Ji bilî van maran ev cureyên maran jî hene.

**Kurmar:** Jara vî cureyê maran pir zêde ye û piranaya zindîyên ku bi wan ve dide, dimirin.

**Zîya:** Ev mar jî marên mezin in ûdi nav marên Herêmê da yên herî mezin in. Dihê gotin ku zîya dikarin carekê da mîhekê daqurtînin.

**Marê fisteq:** Ev mar ji ber ku dengê wan wekî fîtikê derdikeve, weha hatine binavkirin. Rengê van marana piranî zer in lê hinek jê cûn in û ev mar pir dirêj in.

**Marê avî:** Ev marên li qeraxên avan da dijîn û dikarin ajnê bikin. Marê avî di nav gel da wekî marên bêjar dihên nasîn.



**B. Sewalên din yên kovî û hêkdar**

Ev koma sewalan jî hêkdar in û yên ku nakevin jêrenava xişokan di nava xwe da dihewîne. Li gor taybetîyên bedena xwe dihên binavkirin (KÇ 1, KÇ 2).

**Beq:**Komeka mezin ji ajelên bejavî ne, ku hem di nav avê da û hem jî li bejahîyê dijîn. Lingên wan yên paş bihêz in û xwe baş çeng bikin. Koma beqan goştxur in û kurm û kêzan dixwin, ew nêçîra xwe bi zimanên xwe yên dirêj digirin. Li herêma Qerejdaxê ji ber ku çem, best û kanî pir in û şînahîya biharê li qadek fireh belav dibe beq xwe awayekî zêde rê mirovan didin.

**Dûpişk/Aqreb:** Sewalên bijar yên biçûk in. Di nav axê da dijîn. Bi vedana dûpişkan mirov dikarin bimirin. Li Herêmê mehên havînê zêdetir dihên dîtin.

**Moz:** Ev sewal biçûk, bibask û şeşpêyî ne. Bi firîna xwe ya li ser gîya, kulîlk û daran ra tovên nebatan belav dikin. Ev cureyên wan hene.

**Mêşhingiv:** Mozên zer in ku hingiv çêdikin û mirov hingivê wan dixwin.

**Mozqirtik:** Mozên zer in ku hingiv nadin. Cudahîya wan ji mêşhingivan ewe ku rengê wan yê zer hîn bêtirdîyar e.

**Mozên sor:** Mozên ku rengê wan sor in û ji mêşhingivan mezintir in.

### 3. Çanda sewalvanîyê

Di xebatê da hetanî vira em li ser navlêkirina sewalan û polînkirina wan ya li Herêmê rawestîyan. Di vê beşê da jî em dê li ser çanda sewalvanîyê, berhemên çanda sewalvanîyê û hin têgihên li ser vê çandê rawestin.

### 3. 1. Şivantî

Şivan ew kes e ku gundî yan jî koçer sewalên xwe emanetî wî dikin. Ji ber wê jî di çanda sewalvanîyê da şivantî cihekî taybet digire. Şivantî heman demê da karekî bizehmet û xeternak e jî. Lewra dibe ku bûyerên wekî wendabûna pez, ketina guran ya nav pezî, li ber lehîyê çûn û hwd pêk bihên û ji bovan hemûyan berpirsyarîya şivanî heye. Herweha jîyana şivanan bi xwe jî gelek caran dikeve xeterê (KÇ 1, KÇ 2, KÇ 3).

Dengên ku şivan ji bo karê sewalvanîyê derdixin jî mijareka giring e. Lewra şivan ji bo bangkirina sewalan dengên curbicur derdixin. Ji bo bangkirina mêşinan dengekî cuda ji bo ajotina wan dengekî cuda, ji bo bangkirin û ajotina bizina jî dengên cuda cuda bi kar diînin. Herweha ji bo bangkirin û ajotina koma dewaran, ji bo deveyan, ji bo kûçik, pisik û hwd dengên cuda cuda dihên derxistin. Bilûr jî parçeyekî giring yê çanda şivantîyê ye. Ji ber ku di şivantî/gavantî/selwantîyê da carinan ji bo ajotina sewalan, carinan jî ji bo dembihurandinê bilûr dihê bikaranîn.



Di çanda şivantîyê da gelek peyvên cuda çêbûne, ji bo her komeka sewalan navekî cuda hatîye bikaranîn. Loma zimanê kurdî di vî warî da dewlemend e. Li herêma Qerejdaxê ev peyv dihên bikaranîn (KÇ 1, KÇ 2, KÇ 3).

**Şivan:** Kesê ku pez derdixe çêrê. Şivan banga sibê derdikeve heta nîvro û dema esir dîsa derdikeve heta êvarê.

**Şevîn:** Şivantîya ku ji dema sihoran heta nîvro ye. Ango awayekî şivantîya şevê ye.

**Gavan:** Kesê ku dewaran derdixe çêrê. Gavan ji sibê heta êvarê gavanîyê dike.

**Selwan:** Kesê ku hêştiran derdixe çêrê. Ango şivanê hêştiran/deveyan e. Selwan jî wekî gavanan ji sibê heta êvarê selwanîyê dikin.

**Dajo:** Navê alîkarê şivan e. Li hin herêmên din yên Kurdistanê duajo, dûajo jî dihê gotin.

**Kerî/Col:** Navê koma sewalan e ku ji pezan pêk hatîye.

**Naxir:** Navê koma sewalan e ku ji dewaran pêk hatîye.

**Boş:** Navê koma sewalan e ku ji deveyan pêk hatîye.

**Gom:** Cihê ku sewal (pez, dewar) lê dimînin.

**Tewl:** Cihê ku ker û hesp lê dimînin.

**Hevgel:** Kerîya ku mêşîn û bizin tevlihev in û pezên çend malên gundîyan bi hevre ne.

**Delav:** Ew cihê ku sewal avê jê vedixwin ku ev dera hanê cihekî berfirehê devê bestekê an jî serê kanîyekê ye. .

**3. 1. 1. Bangkirina sewalan**

**Dirrê!:** Bangkirina pez ya ji bo hatina ser avê ye.

**Ho!:** Bangkirina dewaran(ga, cange hwd. ) ya ji bo ajotina wan e.

**Yeh!**: Bangkirina bizinan ya ji bo ajotinê ye.

**Deh!:** Bangkirina hespan ya ji bo ajotinê ye.

**Ço!:**Bangkirina keran ya ji bo ajotinê ye.

**Hay!:** Bangkirina deveyan ya ji bo ajotinê ye



**Tû tû!/cûcû!:** Bangkirina mirîşkan ya ji bo xwarinê ye.

**Kiş!:** Bangkirina mirîşkan ya ji bo ajotinê ye.

**Elo elo!:** Bangkirina elokan e.

**Ti dî dî!/Toşt!:** Bangkirina kûçikan ya ji bo qewirandinê ye.

**Pis!/pist!:** Bangkirina pisikan ya ji bo qewirandinê ye.

**3. 2. Bêrî**

Di çanda kurdan ya sewalvanîyê da wekî şivantîyê bêrî jî cihekî taybet digire. Ji ber ku mirov dikare bêrîyê wekî qadeka civakî jî bi nav bike. Li bêrîyê keç û xort dil berdidin hev; hevkarîya gundîyan û malîyan xurt dibe; jin û mêr bê cudatîya zayendê di heman atmosferê da heman karî dikin; agahî û xeberên li nava gund/koçê dihên parvekirin; ji bo qatix şîr dihê dotin û hwd gelek tişt hene bandora wan li ser civakîya mirovan dikin. Yanî gelek fonksîyonên wê yên rasterast û nerasterast hene.

Di bêrîyê da, rojê du caran, saetên berî nîvro û dema esir ji bo dotina pezê li çêrê, derketina gundîyan ya derve ye. Li bêrîyê jin û mêr tevlihev in. Heke

sewalên ku werin dotin hevgel be gundî jî bi hev ra diherin bêrîyê. Heke kerî, ya malekê be endamê wê malê diherin bêrîyê. Di çûna nîvro da firavîna şivan jî bi xwe ra dibin. Bi qedandina bêrîyê ra vedigerin malên xwe û şîrê hatîye dotin dikin qatix (KÇ 1, KÇ 2, KÇ 3).

Çend peyvên li ser çanda bêrîyê ev in (KÇ 1, KÇ 2).

**Bêrîvan:** Kesên ku diherin bêrîyê.

**Hilêbî:** Navê kesên ku pez didoşin.

**Serbêrî:** Kesên ku serê sewalan digirin.

**Dankirin:** Ji bo ku berx şîr vexwin berdana nava hev ya berx û mîyan e.

**3. 3. Berên ku wekî xurek û vexurek ji sewalan bi dest dikevin.**

Sewalên kavêj wekî berî, goşt û şîr didin mirovan. Di vê beşê da em dê li ser berhemên xwarinê yên ku ji şîr peyda dibin, rawestin. Ji bo berên ku ji şîrê sewalan peyda dibin, bi giştî qatix dihê gotin. Cureyên qatixî li Herêmê bi vî awayî dihên binavkirin (KÇ 1, KÇ 2).

**Şîr:** Berê avî ku ji dotina sewalan dihê bidestxistin. Şîr wekî cewahîr jî dihê binavkirin.



**Firo:** Şîrê sewalên nûzayî yê cara ewile û germkirinê tîr dibe weke toraqê xuya dike. Tama wê şîrîne û rengê wê jî zer e.

**Xelindor:** Şîrê ji firo şûnda heta du rojane roja sê yan dibe şîr. Rengê wê spîye û tama wê şîrîn e. Xelindor dikele tîr dibe weke mastê tîr dibe.

**Mast:** Xwarina ku bi heyvankirina şîrî çê dibe.

**Dew:** Mast bi tevlêbûna hinek av di meşkê da dihê kayîn. Piştî ku rûnê çêbûyî ji ser dihê girtin yê mayî dew e. Ev qatix ji bo vexwarinê ye.

**Çeqilmast:** Mastê ku ji bo vexwarinê bi avê hatîye ronkirin, çeqilmast e. Çeqilmast di feraxan da dihê çêkirin.

**Şotik:** Çeqilmastê ku zêde av tev li wî hatîye kirin ku zêde ron e, şotik e.

**Rûnê hîz:**[7] Kefa ku li ser dewê di meşkê da dihêkayîn ji dewî cuda dibe û eger ew kefa ku cuda bûyî mirov têxe ser hev dibe rûnê hîz.

**Rûnê nivîşk:** Ji bo rûnê hîz yê helandî dihê gotin.

7 Rengê rûn û penêrê ku ji şîrê dewaran çêdibe zer e lê yên ji şîrê pez çêdibe spî ye (KÇ 1).

**Toraq:** Ji kelandina dewî toraq çêdibe. Qatixekî ji mast tîrtir e.

**Lorik:** Bi kelandina şujîya ku bi ser penêr dikeve dihê çêkirin û qatixeka tîr e. Şiklê wê wekî penêrê ku hatibe hûrkirin, xuya dike.

**Çurtan:** Ji qusandina dewî toraqek loqloqî dimîne. Eger bihê stran û hişkkirin dibe çurtan. Çurtan dema ku qatix tune be dihê xwarin.

**Penêr/Penîr:** Ji heyvankirina şîrê xav çê dibe. Xwarina sereke ya taştêyan e. Gelek cureyên penêr jî hene. Wekî penêrê hûnandî, penêrê kelandî, penêrê xav û hwd.

**Tomast:** Mast û penêr di çermê şûştî yê xwêkirî da dihên stran û tomast çêdibe. Wekî mastekî tîr e û nêzî tama penêr e.

**3.4. Pîsîya sewalan**

Di çanda kurdan da ji curbicur berhemên sewalan sûd dihê wergirtin. Kurdan ji bilî berên wekî mû, hirî, çerm, şîr, goşt û hwd ji pîsîya sewalan jî sûd wergirtine. Ji ber wê li gor cureyên sewalan nav li pîsîya wan jî hatîye kirin. Pîsîya sewalan di bin du jêrenavan da hatîye dabeşkirin (KÇ 1, KÇ 2, KÇ 3).



**3.4.1. Pîsîya sewalan ya ter**

Di çanda kurda da navê pîsîya sewalan jî li gor cureyên sewalan hatîye binavkirin (KÇ 1, KÇ 2, KÇ 3).

**Rêx:** Pîsîya mange, ga û hwd e.

**Bişkul:** Pîsîya pez, kwêrgî û deveyê ye.

**Ters:** Pîsîya ker û hespan e.

**Zîlq:** Pîsîya sewalên bibask e.

**3.4.2. Pîsîya sewalan ya hişk**

Wekî navlêkirina pîsîya sewalan, pîsîya hişkbûyî jî li gor çêbûna xwe dihê binavkirin. Ev pîsîya hişk ji bo ardû dihê bikaranîn (KÇ 1, KÇ 2, KÇ 3).

**Sergîn:** Rêx û tersên sewalanin kul i mergê, li çêrê kirine û li ber rojê jixweberê hişk bûne.

**Tepik:** Bi tepisandina rêxa ron yan jî bişkulên bi avê hatîye ronkirin çê dibe. Bi destan şikil dihê dayîn.

**Tar:** Bi tepisandina rêxa ron ya ku mirov dixe tara bêjingê çê dibe.

**Kerme:** Bişkul yan jî rêxa ku di gomê da yan jî cihên ku sewal lê dimînin dikeve ser hev û hişk dibe. Ev rêxa hişkbûyî kerme ye.

**Zibil:** Pîsîya sewalan e ku bi demê ra hûr bûyî û ji bo ax were xurtkirin dihê bikaranîn.

### 3. 5. Mû û hirî[8]

Bi qusandina pez mûyê pezên bizinî û hirîya pezê mêşinî bi dest dikeve. Ev berên hanê jî di çanda kurdan da cihekî giring digirin. Ji mû û hirîyê ji bo bikaranînê malê gelek tişt dihên çêkirin. Ji van amûrana yên sereke ev in (KÇ 1, KÇ 2, KÇ 3).

#### 3.5.1. Berhemên ji hirîyê

**Kulav:** Binraxeka mirovan e. Bi xebateka taybet hirî dihê kutan, boyaxkirin û neqişandin û kulav dihên çêkirin.

**Cil[9]:** Ev jî binraxek e û ji bo raxistina binê nivîn û mînderan dihê bikaranîn. Jinên Herêmê bi xebateka taybet, hirîyê bi teşîyê dikin dezî piştra pergala tevnê dihê amadekirin û jin bi amûrên taybet di nava çend rojan da çêdikin. Çêkirina wê zehmet e.

**Nivîn:** Bi dagirtina hirîya şuştî û veçirandî ya cawên dirûtî çêdibin. Nivîn navê giştî yê mitêl, lihêf û balîfê ye.

**Xalî:** Ji bo raxistina binê malê yan ji bo runiştina li ser wê, dihê bikaranîn. Xalî jî wekî cilan bi tevnê dihên çêkirin.

**Heqîb:** Wekî du bêrîkên mezin in ku mirov davêjin ser pişta hespan û tiştên xwe dixin wan.

#### 3.5.2. Berhemên ji mû

**Kon:** Ji bo stirandina mirovan û sewalan dihên bikaranîn.

**Ben:** Ji mû çêdibe ji bo dirûtina amûrên stûr dihê bikaranîn.

**Têr:** Wekî du bêrîkên mezin in ku mirov davêjin ser pişta keran û tiştên xwe dixin wan.

8 Wekî mû û hirîyê ji çermê sewalan jî ji bo sol, def, erbane, meşk, kun û hwd. sûd dihê wergirtin(KÇ 2).

9 Di nava gelek herêmên kurda da cil wekî kinc dihê binavkirin lê ev tegih ne ew e (F.K.).

**Çewal:** Kîsên mezin in ku ji bo hilanîna zad û hwd dihên bikaranîn.

**Cuher:** Mûyê pezên bizinî yên hatîyeristin dibe dezi û ev dezî dikeve tevnê weke tejikan çêdibe û dûre ev tiştê ku ji tevnê dertê weke tûrekî tên dirûtin. Cuher ji bo tiştên biçûk û sivik tên bikaranîn.

Ji bilî vana ji mû, cil û kulav jî dihên çêkirin.

**Encam**

Di vê xebatê da xuya ye ku herêma Qerejdaxê ji alîyê navlêkirina sewalên kavêj da dewlemend e. Sewalên wekî pez, dewar, deve li gor zayend û temenênxwe cuda cuda hatine binavkirin. Dîsa di xebatê da tiştekî din yê balê dikêşe jî ew e ku di vê çandê da navlêkirina sewalên kovî ye. Sewalên kovî (bi taybetî mar û xenzîr) ku bi awayekî hûrgulî hatine binavkirin dibe ku ji ber fikira tirs û xweparastina ji van kovîyan be. Mirov çiqasî neyarên xwe nas bike ewqasî dikarin xwe ji wan biparêzin. Dîsa li gor berjewendîya mirovan li ser navlêkirina mozan jî hûrgilî hene, ji ber ku hinek moz bi hingiv in û sûd ji wan dihê wergirtin hinek moz jî bê hingiv in.

Di navlêkirina hinek sewalan da bandora dimilî (kirmanckî) û zimanê erebî xuya ye. Agahîyek din ya cihê kêfxweşîyê jî xuya ye ku kurbeşk li herêmê dihên nasîn ango li herêmê hîn hene. Ji ber ku nifşên kurbeşkan bi tunebûnê ra rû bi rû mane.



Di navlêkirina navên berazan da xuya dibe ku di nav gelî da bi awayê sewalên çewligê hatine tesnîfkirin. Li gor nêr, mê û çêjik cuda cuda binavkirinên wan hene. Ji ber wê dibe ku li vê herêmê di demek ne dûr da di nava gelî da beraz hatibin xwedîkirin. An jî dibe ku cîranên kurdên herêmê beraz xwedîdikirin di bin bandora wan da ev navlêkirin derketibin holê.

Xebat ji alîyê navlêkirina sewalan û çanda sewalvanîyê ya herêma Qerejdaxê ve wekî tomarkirinekê ye. Ev jî ji bo xebatên ku dê li ser vê mijarê bihên kirin dikare wekî çavkanîyakê bihê bikaranîn.

**Çavkanî**


Akerson, F. E. (2000). *Türkçe örneklerle dile genel bir bakış.* İstanbul: Multilingual Yabancı Dil

Baskıcı, M. (1998). Evcilleştirme tarihine kısa bir bakış. *Ankara Üniversitesi SBF Dergisi*, 53(01) , 73-94. Doi: https://doi. org/10. 1501/ SBFder_0000001944

Çoban, H. (2017). Eski çağda ilk evcil hayvanlar ve deve. *Journal of Social And Humanities Sciences Research (JSHSR)*, 11, 554-560.

Ertekin, S. (2002). Karacadağ'da bitki çeşitliliği. Diyarbakır: Sürdürülebilir Kırsal ve Kentsel Kalkınma Derneği. (Mêjûya jêgrtinê: 14. 01. 2020) Jêgirtin ji http://www. surkal. org. tr/dynamicContent/2_ KaracadagBitkiCesitliligiRaporu.pdf

Ertuğrul, M. , Dellal, G. , Soysal, İ. , Elmacı, C. , Akın, O. , Arat, S. , Barıtçı, İ., Pehlivan, E. ve Yılmaz, O. (2009). Türkiye yerli koyun ırklarının korunması. Uludağ Üniversitesi Ziraat Fakültesi Dergisi, 23(2), 97-119. (Mêjûya jêgrtinê: 14. 08. 2020) Jêgirtin ji https://dergipark. org. tr/tr/ download/article-file/154098

Ong, W. J. (2013). *Sölü ve yazılı kültür, sözün teknolojileşmesi.* (werg. S. Postacıoğlu Banon). İstanbul: Metis.

Uçar, İ. (2013). Türkiye Tükçesinde hayvan adlarından türetilmiş bitki adları. Uluslar arası Türkçe Edebiyat Kültür Eğitim (TEKE) Dergisi, 2(1), 1-19.


**Kesên Çavkanî**

KÇ 1: Galya(Xalya) Kaplan (J. 1939-) Li Gundên Seferya, Meyremçayir, Hesarê Tenûrê jîyaye (Hevpeyvîn, gulan 2015)

KÇ 2: Osman Kaplan (J. 1945-) Li Gundên Seferya, Meyremçayir, Hesarê û Tenûrê jîyaye (Hevpeyvîn, gulan 2015)

KÇ 3: Mustafa Taş (J:1977-) Li Gundên Qerimçî, Çixirxê jîya ye (Hevpeyvîn, pûşper 2015)

**Pêvek 1:**

**Ferhengok**

Ev pêvek ji bona hinek peyv baştir werin famkirin û hin têgihên di nava xebatê da ji xwe ra cih nedîne bihê xuyakirin wekî ferhengokekê hatîye amadekirin. Hemû peyvên di vê beşê da ji KÇ 1, KÇ 2, û KÇ 3 hatine berhevkirin.

**Bask:** Organê taybet yên teyr û sewalên pînê ne. Pê dikarin bifirin.

**Biberbûn:** Di sewalên guhandar da hemlebûn e.

**Daş kirin:** Şehkirina hirîya sewalan e.

**Dêl:**1)Li herêmê ji dûva sewalên ji pezên mêşinî pêve ji yên din ra dêl dihê gotin. 2)Kûçika mê.

**Daw:** Dela pezê mêşinî yên bi bez û mezine

**Dolan:** Bezê li ser organên hundurîn yên sewalan e.

**Dotin:** Bi guvaştina guhanên sewalan şîrjêanîn.

**Firşik:** Hûrê berx û karan e.



**Gem:** Amûra ku ji bo ajotina hespan dikeve devê wan.

**Harbûn:** Nexweşîyek e**.** Sewala ku bi gezkirina sewalên nexweşîya harbûnê pêre hebe ew jî har bibe. Bi tirkî “kuduz” dihê gotin.

**Hawid:** Cihê taybet yê rûniştinê ye ku li ser pişta deveyan dihên danîn. Hawid ji qamir dihê çêkirin.

**Hevrîng:** Meqesa taybet ya ji bo birîna hirîya pez.

**Kayik anîn (kayîn): 1**)Wekî benîşt cûtina xwarina berê xwarî ya hin sewalên guhandar e. Mînak: Ga kayika xwe tîne/dikayî. **2**) Kayîn: Ji bo dew çêbibe di hundirê meşkê da lihevxistina mast e. Mînak: Bêrîvan dew dikê.

**Kedik:** Kîsê biçûk yê dew e.

**Kol:** Sewalên ku qiloçên wan tune ne.

**Kumik:** Organeka li ser serê sewalên wekî mirîşk û elokan.

**Kun:** Alava avê ya ku ji çermê bizinan çêdibe.

**Lem:** Organa sewalan ya şîr tê da kom dibe û şîr jê dihê.

**Lîwan:** Rişmeya serê hespan e.

**Lûs: 1 )**Vewestana sewalên bibask in. **2)** Cihê bêhnvedana sewalên bibask e.

**Mexel:** Rûniştina sewalan e.

**Milik:** Bilindahîya li ser pişta hêştiran e.

**Mitirh:** Cihê taybet yê rûniştinê ye ku li ser pişta hespan dihê danîn. Mitirh ji kulav dihê çêkirin.

**Nikil:** Organa hişk û tûj ya ku ji bo sewalên bibask peywira lêv û dirana dibîne.

**Pence:** Lingên taybet yên sewalên bibask in.

**Per:** Navê din yê bask e.

**Qusandin:** 1) Birîna hirîya pez e. 2) Tîrkirina/tîrbûna şîr û berên ron e.

**Qoç:** Qiloçên sewalan e.

**Sim:** Lingê sewalan yên ku ji neynûkên taybet pêk dihên.

**Sorîng:** Boyaxkirina sewalan e. Ji bo ku sewal ji nexweşîyê were parastin, bi boyaxeka ji xwezayê hatîye bidestxistin dihên nîşankirin. Yan jî dema beranberdanê da bi boyaxa sor nîşankirina pez e.

**Stewr:** Sewalên mê yên ne biber in.

**Xesandin:** Ji nêrîxistina sewalên nêr in.

**Tapan:** Lingên taybet yên pan yên hêştiran e.

**Tevn:** Amûra ji daran çêbûyî ku pê xalî, tej, şijde û hwd dihên çêkirin.

**Zayîn:** Jidayîkbûna sewalan e.

**Pêvek 2:**Tabloya Navên Hinek Sewalan li Herêma Qerejdaxê bi Kurdî-Latînî

| Kurdî | Latînî | Kurdî | Latînî |
|---|---|---|---|
| Mî | Ovis aries | Gurcan | Rattus rattus |
| Bizin | Capra aegagrus hircus | Fisteq | Microtus arvalis |
| Mange<br>Cange | Bos taurus<br>Bos primigenius taurus | Kûsî/Kosî<br>Req | Testudinidae<br>Mauremys caspica |
| Deve | Camelus | Marîjok/ Marmarok | Ablepharus bivittatus |
| Hesp | Equus coballus | Gumgumok | Hemidactylus turcicus |
| Ker | Equus asinus | Mar | Serpentes |
| Mirîşk | Gallus gallus domesticus | Marê reş | Coluber jugularis |
| Kûçik | Canis lupus familiaris | Marê sor | Coluber schmidti |
| Pisik | Felis silvestris catus | Marê belek | Coluber ventromaculatus |
| Elok | Meleagris gallopavo | Marê cûn | Vipera albizona |
| Ordek | Anatinae | Kur mar | Typhlops vermicularis |
| Qaz | Anser anser | Zîya | Spalerosophis diadema |
| Xenzîr | Sus scrofa/Sus domesticus | Marê avî | Natrix natrix |
| Keftar | Hyaena hyaena | Marê qiloç | Vipera ammodytes |
| Kurbeşk | Meles meles | Beq | Anura |
| Rûvî/Rovî | Vulpes vulpes | Dûpişk/Aqreb | Leiurus quinquestriatus |
| Jûjî/Jûjo | Erinaceus concolor | Moz | Antophila |
| Sîxur | Hystrix indica | Mêşhingiv | Apis Mellifera |
| Siworîk: | Sciurus anomalus | Mozqirtik | Vespula germanica |
| Kwêrgî | Lepus europaeus | Mozên Sor | Vespa orientalis |
| Mişk | Mus musculus | | |